

## Dumahîk: Sazûmana Beşar

giring, helwestîn xwe di warê guhertinên siyasî û çalakiyên xwe jî di nava raperînê de, li ber ronîya wê hatin ava dikirin, mîna "desteya hemsazî ji bo guhertina demokratik li Sûriyê" û hwd..

Di wê karnavê de, tevgera niştimanî ya gelê Kurd li Sûriyê jî di wê baweriyê de de bû, hemî partî û rêxistinên wê jî, pilanameya xwe ya ji bo guhertina sazûmanê, bi serkêşî û serperştîya serok komar pîşniyar kir. Û ra piştî dora çend mehan ji serhildanê, û belkî ra niha jî, hîn bawerî bi guhertina sazûmanê bi serkêşîya serok komar û ji hundurê wê de li ba hin aliyên rikbera Sûrî li cihê xwe ye, wek mînak, "kongira niştimanî ya Kurdî" li ser wan hêviyan hat girêdan.

Lê belê, piştî borîna bêtirî deh mehan di ser serhildana gelê Sûrî re, û herikîna lehiyên xwîna xwepêanderên azadîxwaz ên sivîl li ser destê destlatê, serok komar û sazûmana wî, pêşniyarên guhertina bingehîn ji ti kesî qebûl nekir, û wî bi xwe jî ti guhertinên giring û pêwîst di hundur xwe de ne kir, li bervajî wê, sazuman li ser gotina "li dijî Sûriyê pilaneke navdewletî heye" û hîn jî bi îsrar e, û li ser wê binyatê, hemî şeweyên tundûtûjiyê li dijî rikber û xwepêşanderan bi kar tîne. Di vê karnavê û di van deh mehên şoreşê de, mixabin, bi hezaran qurbanî ji xwepêşanderên sivîl û leşkerên artêşê, û çakdarên sazûmanê ketin, bi deh hezaran girtiyên serhildanê di girtîgehên dewletê de hene, û gelek şengeh û bajarên mezin jî hatin bumbebarankirin, ji bilî wan hemî tiştan, dewlet jî û civak

H.WD de çûne ber heraftin û hilweşînê.

Li roja îro, pirsine giring li ser zimanan digerin, û ji gelek aliyên siyasî tînin kirin, jê: Hîn hêvî heye ku sazûman ji hundur ve were guhertin? Eger bersiv erê ye, kanî qelewîzên wê çi ne? Lê eger bersiv na be, gelo! dem ne hatiye ku hêvî ji sazûmanê were birîn, û daxwaza "rûxistina sazûmanê" bibe dirûşm her aliyekî siyasî, êşkere were hildan, û xebatek xurt û hevbeş ji ber ve were kirin?

**Rozad Elî**

## Komkujiya gundê Roboskiyê

Ji ber zordarî û tunebûnê, li hemî welatan, egundiyên sînoran, tiştan ji wlatên xwe di sînoran re debas dikin, an jî tînin. Sînorê Tikiyê û Îraqê ji kevin ve, qaçqê dibe. Ji bo berdewamiya jiyana xwe, mazot û paketan ji wir tînin û li Tirkiyê difroşin. Di 29 ê Berçile de, destlata Tirk bi balefiran, gundiyên Roboskiyê – herêma Şirnexê – yên li ser sîror bobekirin û ji enjamê 36 gundê hatin kuştin. Tevî destlata Tirk, aşkerekir ku, bi şaşitî ev bûyer bû ye. Lê, ev ne cara yekê ye ku, ev reng kar destlat dike.

Bi navê rêdeksiyona Newrozê û hemî xwendevanên wê, em vî karî şermezar dikin û bila sere xwediyên wan sax be.

